Aştanayê mîna yê beriya xwe bê encam bû. 29-30'ê mijdarê di rojên xwe Aştayê dihat lidar xistin ser xaka Rojava-Bakurê Sûriyê li navçeya Eyn Îsayê Hevdîtina Sûri-Sûri pêk hat, çî qas piştgiriya navdewletî jêre tine bû jî, lê dikaribû nexşerêyên jî bo çareseriyê pêşkêş bike.

Kurd Pêvajoya Serdema Nû

Di heman demê de mirov dikar bibêje Kurd êdî piştî ev qas liştokan bi ser hişê xwe de hatine û baş li vî qonaxê meyze dikin.

Yanî hewil tê dayin hêzeke niştimanî ya hevbeş were ava kirin.. Belam hinek pirsgrêkên navxwe hene, bê kî serdar û rêzanê vî qonaxê be.

Kurd hêdî hêdî ji kêşeya DAIŞ'ê bi dawî dibin, lê raştiya kelema dîr-jihevûna partiyên siyasî tî. Yekitiya Kurdan vî yekê misoger dike..

Ya girîng em berjewendiyên stratejîk ên gelê Kurd di ser berjewendiyên take-kesî, partîti û malbatî de bibînin Yekiti bi xwestek û siloganan pêk nayê, Kurd pêdiviya wan bi yekitiyê heye.

Bê guman kilîta vî yekitiyê lidarxistina kongreyeke neteweyî Kurdistanî ye, lidarxistina vî kongreyê gaveke dîrokî û serdemî jî gelê Kurd re.

Divê hemû partiyên kurdîstanî li hemû aliyên kurdîstanê nakokiyên xwe deynin aliyekî jî ji bo lidarxistina kongreye neteweyî ya Kurdistanê nexşerêyê amade bikin.

Dewletên ku bi sedên salan nakokiyên wan hebûn, di mijara doza Kurd de bûne yek...

Divê Kurd jî di mijara doza xwe de yek dest bin û li dijî neyarên xwe serî netewînin.

Ji bo çî be çî-kirina mafên rewya yê gelê kurd ev yekiti armanca herî pîroz û bi nîrx e.

Kurd di vî serdemê de pir arguman di dest wan de heye ku neyar parçebûna wan û şaylê wan yê jîyan dizayin kiriye. Yekiti

û hevrêziya Kurdan misogeriya sereke ye ji bo peydakirina mafê Kurd ên rewya, ev yekiti divê bibe armanca herî girîng û pîroz ku rewşenbîr, nivîskar û xudan wijdanên zindî ji bo wê tekoşin û xebatê bikin, û hevrêziya Kurdan ava bikin, Kurd pir hewcedarî hevrêziyê ne, ji ber ku ew di bin dagirkeriyê de ne. Her wisa Gelên Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava gereke di wê fêrê de bin ku bêyî yekitiya gelê kurd ne mumkine ew kêşeyên navxwe çareser bibin

Hevsengiyên Navnetewî

Raştiya şerê cihanê yê sêyemîn di kûrbûna kaosa modernîteya kapitalîzm de her ku diçe eşkera dibê.

Ji ber hevnegirtina berjewendiyên hêzên navdewletî û herêmî, zihniyeta dewlet deşthilatdariya hegemon pirsgrêk û nakokiyên ku hene kûrtir dike.

Dewleta Rûsiya ya ku piştî hilweşîna Yekitiya Sovyatê, bi pirsgrêkên navxweyî ve mijûl dibû û nedixwest bandora wê li sê dewletên ku berê di bin sîwana wê de ne kêm bibe. Niha ne weke hêzeke bedil, lê weke hêzeke hegemon, deşthiladar bi DYE re ketiye nav pêşbirkê. Dewletên dagirker, faşîst û qirker jî weke Îran, Sûriyê û Tirkîyê jî, ji bona paraştina ştatûk parêziya xwa, xwe dispêrin Rûsiya û dixwazin temenê xwa yê kêmbûyî dirêj bikin. Ev dewletên ku mijara gotinê ne di nava xwe de bi nakokî, lê jî ber ku qedera wan yeke ji neçarî bi hev re tevdiqerin.

Dewletên Yekbûyî Emerika DYE ku serkêşiya hevpeymanîya navdewletî dike, ji bo paraştina serweriya xwe û pêşgirtina Li Rûsiya di nav hemleyê de ne.

Ji aliyekî ve dixwazin ştatûk parêziya heyî bi guherin, lê belê dema ku li gorî berjewendiyê wan be. Ji bo ku hêzên demokratîk, civakî û sosyalîst ji vî guhertina heyî sîd wernegirin siyasetek marjînkirinê dimeşînin. Dema ku em di vî çarçoveyê de rewşa heyî bigrin dest wê bi rengekî hîn baştir ji mere xuyabe.

Di serî de û li gorî ku tê xuyakirin wê rewşa Idlibê dirêj bikşîne,

ji ber ku itifaqên heyî ne saxlemin û nakokiyên heyî xurtir dibin. Tu hêzan di wateya stratejîk de lihevnekiriye.

Ji ber wê xerîteya siyasî zelal nebûye.

Hêzên hevpeymanî bi zanabûn çavên xwa ji Tirkîyê digrin, ji bo hîn bêtir bandorê li ser bikin. Xalên çavdêriyê jî yên ku hêzên hevpeymanî avadîkin armanca ew e ku dixwazin xwe li wir bi cih bikin û serweriya xwe avabikin. Piştî bidawîbûna DAIŞ'ê li Dêra zorê rewşa heyî wê berê û kû ve biçe û wê çî bibe nediyare !!

Her weha jî ber ku peyman di navbera Tirkîyê û Rûsiya li Idlibê bi ser neket, Tirkîyê kete nava gereke jêveveger de. Ji ber ku ew ne dikare rewşa heyî bigre bin serweriya xwe û ne ji dikare raşte-raşt dijberiya Rûsiya û Rêjimê bike.

Ji ber wan sedeman ew her di cihê xwe de dijmêre û dixwaze vî rewşa heyî heyânî buharê û hilbijartinan weke xwe bimîne. Lê li ser erdê her roj şer û pevçûn di navbera Rêjim û çeteyan de rûdide û di vî warî de barê herî mezin dikeve ser milê Tirkîyê.

Di rojên dawiyê de Rûsiya jî êrişên ezmanî birin ser Idlibê û weke ku tê xuyakirin ev cara yekemîne piştî peymanî di navbera Rûsiyê û Tirkîyê de ku Rûsiya êrişên ezmanî dibe ser herema Idlibê.

Armanca van êrişan ew e ku Rûsiya dixwaze tawizan ji Tirkîyê bigre û çeteyên li Idlibê hin bi hin bê bandor bike û wan di nava şerê xwe bi xweyî û şerê deşthilatiyê de tunebibe. Di encamê de hem Rûsiya û hem jî hêzên hevpeymanî her yekî ji wan



■ Elî Roj

hêzan dixwaze ku şikandina DAIŞ'ê û tunekirina wê li Sûriyê bi destê wê pêk were. Ji ber vî yekê her hêzekî jî van hêzan dixwaze herêma ku hêza din li wir serwere tîxîne nava çiravê û li pêşiya wê aştengiyên çê bike.

Ji milekî din ve jî kiryarên dagirkerên tirk û çeteyên wê li Efrînê bi hemû dijwariya xwe tê kirin û di vî warî de mirov dikare bibêje rewşa heyî ketiye qonaxeke nû.

Dagirkerên tirk di bin navê şerê li hemberî gendeliyê û kurtêlxweriyê de, dixwazin çeteyên ne li gorî berjewendiyên xwe ji holê rake û bi vî yekê deşthilatiya xwe li ser Izaz, Bab, Cerablus û bi taybet jî li ser Efrînê bi temamî çê bike. Her weha ji neha ve dest bi avakirina sasiyan kirine û dixwazin ji raya giştî re biddin xuyakirin ku hin bi hin aramî çêdibe û rewş berê başbûnê ve diçe.

Li gorî ku tê xuyakirin dengiyên siyasî zû tene guhertin û rewşa heyî jî hemû sînyaroyan re vekiriye. Peyman û hevsengiyên ku di navbera hêzên di heremê de ne domdar in li gorî berjewendiyên e.

Peymanên heyî jî li gorî dengiyên siyaseta navnetewî û heremî birêve diçin û her gav qabilê guhertin û veguhertinê ne.

Rojev



■ Selaheddin Yûsiv

Di encama şerê li Sûriyê de, hêzên sermeyedar hebûna xwe li ser vî axê diparêzin. Ji bo wê jî şoreşa Sûriyê jî şoreşgertiyê bidûr xistin. Avakirina komên çekdar ku şerê hev dikin, di raştiyê nûnerên wan hêzên navdewletî yê mezînin. Aliyên şer, çepgir û rastgir em dikarin binav bikin, Sûriyê weke qadeke ku şerê cihanê yê sêyemîn li ser tê meşandin, şer dikin, di encamê de tu projeyekê wan a çareseriyê nîne. Berûvajî wê, kîjan hêz dikare bibe sermeyedarê cihanê, wê di encama vî şerî de were diyarkirin. Li rojhelata navîn, lihevkerin û hevpaçyman tî guhertin. Ya serdest, berjewendî ye. Yanê dostê duh dijminê îro ye û dijminê duh dostê îro ye. Ji bo wê em dibînin ku weke hêzeke cudayî van hêzên heyî, QSD derket pêş û projeyekê ji bo çareseriyê aloziya Sûriyê pêşkêş kir. Lê weke kurd ku hebûnekê ava dikin, ji bo ewlekariya neteweyî ya dewletên dagirkerên Kurdistanê dixwe xeteriyê, ew dewletên li ser axa Kurdistanê di encama hevpeymanan de hatine çêkirin, di mijara Kurd de dibin yek. Ya aşkere şerê hebûna Kurdan dike jî Tirkîyê ye. Lê ji ber Kurdên Bakurê Sûriyê bi Kualîsyonê re havpeyman danîne

û şerê Daişê dikin, di piştê re, Tirkîyê êriş vî erdnîgariyê dike, ya diyar Tirkîyê naxwaze Daişê bidawî bibe, ji ber wê avakiriyê û her destekê didê ye. Li aliyekî jî Rûsiya, ji ber berjewendiyên xwe ku bi awayekî fermî Sûriyê bi rê ve dibe ku tenê rêjîma Baas û Essed weke peykerekî mane.

Hebûna Kualîsyonê li bakurê Sûriyê wê domdar be, berûvajî hin daxuyaniyên fermî ên derdikevin in, ji ber hebûna wê, di serî de rê li pêşiya Îranê digire, a rast jî bi vî mandîne, welatên Kendavê diparêze. Di encamê de şerekî aborî ye, ku ka kîjan hêz dikare bazarên xwe biparêze. Ji ber Tirkîyê hevkarê Emerika ye û endamekî Nato ye, Emerika zû dev jê berna-de. Ya hiştiye ku Tirkîyê berê xwe bide Rûsiya û hevpeymanan çêbibe Kurd in û di encama wê bazariyê de Efrînê dagir bû, ya rast şerê li hember Kurdan e. Ji bo Emerika bikaribe Tirkîyê razi bike û ji Rûsiyayê dûr bixe, divê pîvanekê di navbera Tirkîyê û hebûna xwe li bakurê Sûriyê çêbibe. Ji bo wê, hewildanên Emerika ku Tirkîyê û QSD/MSD li ser masyekê rûnin, pir in û dawî de jî ev yek wê bibe, ji ber li Tirkîyê pirsgrêkên navxweyî û aborî wê ber bi hilweşandinê ve dibe. Ya Tirkîyê dixwaze, a yekê li motika Kurdbûyîne bixe, dagirkirina Efrînê jî ev peyman bû. Ya din jî rewşa aborî ye, divê Tirkîyê çavkaniyên aborî bi hevkarîya Rûsiya û rêjîma Baasê bide bixwe, ji bo wê jî deriyekî nû li Efrînê vekir. Ku Emerika rê li pêşiya vî

hevkarîya Tirkîyê û Rûsiyayê bigire û Tirkîyê bi Rêveberîya xweser li Bakurê Sûriyê bide pejirandin, divê hevkarîyê aborî di navbera Bakurê Sûriyê û herêmên di bin dagirkeriya Tirkîyê de çêbibe. Ev jî mercekê bîngêhî jî bo diyalogên ku di navbera QSD/MSD û Tirkîyê de, di pêşerojê de dê bîngêhî jî aliyê Kualîsyonê ve dê were danîn. Ji ber hêzeke altîmatîf jî bilî QSD ku şerê Daişê bike tune ye, hebûna Kualîsyonê jî li ser wê esasê ye, ji ber wê jî diviya bû hin soz û şîrovekirin li ser êrişên dewleta Tirk bidana, bersiva yekê gera li ser sînor, ya duyemîn avakirina navnedên çavdêriyê û ya sêyemîn jî destekdayîna leşkerî û perwerde-ya QSD ye.

Gefên dewleta Tirk li ser Bakurê Sûriyê heya hilbijartinê meha Adarê ya şaredariyê wê her hebin, lê nikare ti gaveke din weke ya Efrînê biavêje, ger gaveke bi wî rengî avêt wê Tirkîyê di demeke nêz de were hilweşandin. Ev yek jî di van deman de ne ji berjewendiyê Emerika û Ewropa û Rûsiyayê ye. Ger Emerika û tevahî Kualîsyon ji Bakurê Sûriyê derkeve, dê Dewletên Kendavê û Îsrailê ve tîkevin xeteriyê û Îran dê li tevahî Sûyê belav bibe, Rûsiya û hevkarên wê dê bibin sermeyedarên cihanê û Ewropa dorpêç dibe û rewşa aborî Ya Emerikayê dikeve xeteriyê. Ji bo wê jî divî Kualîsyon destekeke siyasî jî bide rêveberîya Bakurê Sûriyê. Dawî de jî ger Tirkîyê ji xaka Sûriyê dernekeve wê bi ber pêla hilweşandinê keve.

Hunermend Dilo Doxan:

Hunera Kurdî Hêjaye Bighêje Her Devera Cîhanê

- Elmanan zêde ji Mûzîk û Çanda kurdan hez dikin
- Li Rojava Hunera Min bi Sînor Dibû, li Ewrûpayê derfet têne dayîn
- Bê layenbûna min di stranên de, dema ku min ser Leşkerên çar aliyên welêt ştra diyar bû
- Ez bi Hunera Ciwan Haco û Şehîd Hozan Serhed bandor bûm
- Ez ê di vê demê de hin stranên Sîngil û Filklorî bibêjim

Hevpeyvîn: Berzanî Ferman

- Bi xêr bî Dilo Doxan can, tu nû ji Elmanyayê ve hatiye Rojavayê Kurdistanê hêviya seredaneke xweş bo te dixwazim

Gelekî spas her hebî..

- Hemanê despêkê ji te bipirsim li welatê ku tu lê bûyî, xelkê wê derê çawa hunera Kurdî diditin ?

Li welatê ku min lê jiyan dikirî meqsêda min Elmanyayê, Elman bi taybetî ji Mûzîk û Çanda Kurdan hez dikin. Ev yek jî diyar bû ku dema gencên Kurd ku nû dest bi karê hunerî dikirin dihatin Elmanyayê dîna xwe didan wan û alîkariya wan dikirin. Her wiha dihiştin ku li gel wan gencan ruhekî afrîneriyê li gel wan çê bibe..

- Tu ji bo çî Ewrûpayê ? 2009'ê ez koçî derveyî welat bûm, Ez wekî Xortekî Kurd mûzîka min, hunera min li Rojava bi sînor dibû, Berê min kete Koçberiyê de, xewna min e ku ez bikaribim gavên mezin di aliyê hunerê de bavêjim, lewra min biryar da ku biçim Ewrûpayê û hunera xwe pêşbixim, çimku şert û mercên welêt astengî-bûn li pêşîya serkeftina min di warê hunerî de..

- Kurdên Diyasporayê angoyên derveyî welêt ji stranên te hez dikirin ?
Car Caran ew hezkirin ji aliyê heştî ve digê min, ez pê dihesim ku kurdên Diyasporayê hez hunera min dikin.

- Te stran ser Şervanên YPG û

YPJ'ê ,berxwedana serdemê ya Efrînê û şoreşa Rojava jî gotine, her wiha stranên ser Pêşmergeyan jî hene, tu di stranên xwe de şoreşa 19'ê Tîrmehê û destanên Pêşmerge li Başûrê Kurdistanê çawa dinirxîni ?

Bi destpêbûna Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmeha 2011'an û heta roj îro jî, çî bûyerên ku çêbûn serkeftin bin yan jî binkeftin û îşî bin me anî ziman, her wiha qehremaniya şervanên me jî kirin li her çar aliyên Kurdistanê, YPG/YPJ ,Pêşmerge û Gerîla cihê rêzgirtinê ne û min ştan ser wan jî vegotin û ez her dem jî bibêjim, ev e erke ser milê min e..

Strana Efrînê jî kete Rojava min de, Yanî min xwest ez peyamekê bighînim gelê Efrînê (Em bi were ne, dilê me bi we re ye, êşa me êşa we ye)

Lewra Erkê min her êşek yan jî serkeftin be ez bi lêv bikim û ji gelê xwe re pêşkêş bikim.

- Heta çi qasî te karî bû di stranên xwe de bê-layen be ?
Ez bawerim bê layen bûna min jî hunera min diyar e, ger we şopandibe û guhdar kiribe, helbet gava ez cûdahiyê nexin navbera û hêzeke eskerî Kurdî de bê-layenbûna min nîşan dide.

- Te li Rojava çî dît çî bihîst, nirxandinên we çî ne?
Ji 2011'an ve ez nehatime Warê xwe heştêkî nayê ziman, dirokeke din didim 2015'an tenê ez heft rojan li Kobanê mam piştî rizgar kirin , lê ev e 7 sal nehatime warê xwe Cizîrê, Guhertinên ku çêbûne û hebûna me ya îro li vê derê cihê şanazyê

ye, serkeftineke berbiçav çê bûye, em îro dibînin ku xuşîk û birayên te diparêzin, bi xwedê heştêkî nayê ziman.. Yanî tevî bûyerên ku li Sûriyê çêbûn, îro tu li Rojava dinêrî ti hêz digre ji şervanên xwe, kurd dibêje ez heme ez karim welatê xwe biparêzim.

- Kengî mûzîk û hunerê bala Dilo Doxan kişandî û yekem strana te gotî çî bû ?

Ez ê behsa xwe bikim, Dilo xwe di malbateke hunerî de dîtîye, Birayên min Ronî, Sabir û Deysim ez dikarim wan bînim ber çavên xwe yanî bandora wê malbatê li min heta radeyekê bûyî, Ez di temenekî biçûk de bûm, ez fêrî entrosmentan dibûm malbatê dît ku ez gav bi gav nêzî warê hunerî dibim, her dem malbat palpiştê min bûyî Tê bîra min di navbêna salên 1995-1996'an de bû ştarneke bi sazê min lê dabû navê wê (Ala Azadiyê) bû, xebatkarên MED'TV wê çaxê ev stran jî min re kişan-dibûn.

Di heman demê de sala 1995'an Mihreçaneke Şebab Sûrî hebû, min xelata Yekem ser asta Sûriyê wergirt di sazbandiyê de..

- Elbûmên te bi navên Rebenê-Dildaro û Hestên Dûriyê hene, tu hazirtiya ti Elbûmên tin dîke ?

Na niha hazirtiya Elbûman nakim, lê hazirtiya stranên sîngil (yên bi tenê) dikim..

- Li kurdistanê her

hunermendekî nûjen pêşengekî wî heye, tu wekî Hunermendekî genc te hunera xwe ji kê girt ?
Bandoriya Ciwan Haco li min bû hunermendekî mezin e û bi nav deng e , Mihemed Şêxo, Aram Tigran, her wiha Ş. Hozan Serhed bi awaz û dengê xwe bandoreke mezin li min kirin.

- Piraniya Stranên te helbestên kê ne?

Em bêjin helbestvanek bi rengekî tenê tine, ez dixwazim di stranên xwe de ciyawaziyek hebe, lê Helbestvan Xelîl Kalo, Ferhad İçmo, Hekîm Sefqan , Elendê Üsiv, Nûh Silêman min hin helbestên wan wergirtine û kirine stran..

- Ta niha Dilo Doxan Çend stran berhem anîne û şeweyê vegotin û şaylê wan bi çî awayî bû ?

Elbûmên min ku çêkirin min ne dixwest bi rengekî wisa komprîs (Muuqaed) bêne deşt girtin û guhdar kirin, Lê wisa min xwest ku nêzî dilê guhdaran be, di vê dema dawiyê min çend stranê sîngil vegotin, di wan stranên de min hewil da ku guhertinek ciyawaziyek di rengê Milodî yanî jî di rengê stran-vegotinê de be, hindêkî ku hişmendiya guhdaran firehtir bikim, lê dixwazim bibêjim ev şaylê ku min li ser karkirî hatiye hez kirin û ez tê de berdewam im.

- Di bala we de heye ku hun strana duyoto çê bikin, û kîjan hunermenda Kurd di bala we de ye?

Tiştê ku dilê guhdaran hezkerîyan xweş bike, ez ji bo wê amade me, lê halê hazir tiştêkî wisa di bala min de tine ye, Ger têkeve bala min de jî navê ku ez ê hilbijêrim ne diyar e, tekez ew kes jî wê hunermendek nûjen be.

- Gelo di projeya Dilo Doxan de heye ku ew bi zimanê biyanî strana çê bike?

Sedî Sed çawa be bi çî rengî be wekî hunermendekî kurd ,divê agahiyên min ser Edebiyatên çend miletên dinê hebin mirov bikaribe wan jî fam bike, ger bixwazim nameyekê bi zimanê xwe bidim û ne gişt, wê çaxê helbet ez ê bifikirim bi zimanekî biyanî nameya xwe bighînim.

- Kî ji Awazkerên Kurd



Stranên te awazkirine ?

Di wan her 3'ê Elbûmên min de piraniya stranên awazê min in , hindêk jî yê birayê min Ronî ne. Herî dawî jî di wan stranên sîngil (Mîna Ba, Reş û Spî, Bo Çi) xortekî hevalê Min Elendê Üsiv ku niha li Elmanyayê jiyan dike ev stran jî bo min bi awaz kirine, ew xortê zanan niha li Univrîstiya Koln ya Elmanyayê beşê Mûzîkê dixwîne, lewra serkeftinekê bû ku ji min re ew stran bi awaz kirin.

- Bêhtirî Stranên te Evînî ne, Dilo Doxan rengê xwe di vir de dît gelo ?

Dilo Doxan ne tenê ji bo Evînê gotiye, lê Evîn jî hêja ye, lê belê Dilo Doxan jî bo azadiyê, dijî Zûlmê, jî bo Şehîdan, xaka xwe û dayika xwe ştan vegotin e.. Ez xwe bi wî rengî nabînim, lê gelê min bi wan stranên Evînî ez baş naskirime..

- Ti hewildanên te hene ku tu stranên filklorî bibêjî û hindêkî dûrî şayilê xwe bikevî ?

Belê, Rengê Filklor em her dem bikar tînin û wekî lêvegerekê bo me hemî hunermendan e, hazirtiyên min hene û wekî erekî ser min vê yekê pêş bixînim, niha çend stran sîngil hene ber deştin ez ê bi dawî bikim, paşê çend stranên 'Radyoya Erivanê' me deştin kirine û ez bibêjim, dîsanê bi hevkarîya hevalê min Elendê Üsiv de.

- Asta Hunera Kurdî gihiştîye çî radeyê li welêt û di heman demê de li derveyî welêt li gorî nerîna te ?

Ti dizanî hunera Kurdî hunereke pîroz e, çî jî aliyê helbestê ve , jî aliyê awaz ve û jî aliyê dengên

xweş ve, lê mixabin di aliyê ragîhandinê de qelsiyekê pir-pir mezin heye di gihandina wan stranên û helbestan jî temaşevan û guhdaran re, em nikarin hunera xwe bikin cihanî sedem jî Ragîhandin e, Hunera Kurdî Hêjaye bighêje her deverê.

- Hûn dixin projeya xwe de ku eger hûn hatin xweştin bo filmên Sînema, gelo hûn erê bikin?

Ez ne dijî wê me, ez ê bikarim tevî bibim, Sînema jî dikeve warê xizmeta çand û hunerê de, dikare civakê ber bi rêyêke pêşketinê ve bibe, ez ê jî cihê xwe tê de bigrim çima na..

- Wê Dilo Doxan çî peyamê jî Rojava bixwe re bibe Alamanîya yê?

Peyama min germahiya berxwedêriya millet, bêhîna azadiyê, belkî ji wisa bêhtir li wir bêjim, lewra peyama min wê zêlal be ji gelê Elman û Ewrûpayê re.

- Beriya ku dest ji vê hevdiştina xweş berdim dixwazim nas bikim projeyên te yê sibe-rojê çine, yan jî stranên te di rêzê de hene ku tê demlîdest bibêjî ?

Ez nikarim wan diyar bikim, lê hazirtiyên vegotina çend stranên Sîngil û Filklorî dikim û ez ê strana (MÎNA BA) ger derfet çêbûn bikime kilîp, lê ji ber guhertina Atmosfêrê û hatin zivîstanê re, fikreya ku me dixwest, dimenên ku me dixwest werin kişandin ji bo vê stranê wê ne nihabin, her wiha jî ber ku Strana Efrînê jî kete Rojava min de ez zêde di fikreya wê stranê de mijûl nebûm.

Hunermendê kurd Dilo Doxan, 1'ê Kanûna 1984'an li navçeya Tirbespiya Qamişloyê ji dayik bû . .

Dilo Doxan xwendina xwe ya seretayî û navîn li wir qedandî . . . Doxan di malbateke mûzîkjen de xwedî bû di destpêka 1995'an dest bi stranbêjiyê kir .

Heman salê Dilo Doxan beşdarî Festivala Mûzîkê ya Gencên Sûriyê bû û xelata baştirîn mûzîkvanê wê dem bi dest xist . . . Sala 2004'an yekem Elbûm bi navê (Rebenê) berhem anî . .

Strana (Bo Çî) ku Dilo Doxan Straye û Birayê wî Ronî Doxan bi awaz kiriye deng veda .

Dilo Doxan Albûma xwe ya 2'emîn (Dildaro) sala 2008'an parve kir . .

Sala 2009'an ji ber sedemên siyasî koçî Elmanyayê bû .

2013'an vegeriya karê hunerî û piştî salekê ji kar û xebatê Albûma Hestên Dûriyê derxist . .

Di heyama salên borî de Dilo Doxan stran ser Şoreşa Rojava û berxwedana serdemê ya Efrînê gotiye . .

Her wiha Stran ser destanên YPG, YPJ li Rojava û Pêşmergeyên Başûrê Kurdistanê bi awaz kirî û gotî . .

Di vê çarçoveyê de Dilo Doxan hindêk Kerneval û çalakiyên kurdên Diyasporayê bi rêve birine . . Dilo Doxan herî dawî berhema (Mîna Ba) ya ji gotin û awaza Nûh Silêman straye . .

Dilo Doxan niha li şarê Hanover ê Elmanyayê dijî û li seranserî Ewrûpayê ahengan lidar dixê . .



Serpêhatî

Dermanê Kêçan



Dildarê Mîdî

Gundî tev li dengê wî haybûn , bandike û dibêje ,hêwaaar ne dermanê Kêçan , dermanê baş , dermanê qenc ji îro pêve hûn dê kêçan nebînin hûnê ji kêçan rehet bibin .

Wek hûn dizanin ku zemanê berê , yek ji pirsgirêkên jiyana gundiyan ew bû , ku êvaran bi şev ji ber kêçan ne dirazehan û xew li wan bi hisret bû .

Gundî tev li wî kombûn û her yekî ji wan , li gor pêwîstî û derfetên xwe dermanê kêçan ji xwe re kirin û pêre jî pîrkêfxweşbûn .

Hin ji wan vejeriyan malên xwe û hin li hevdu kom man. Yekî ji gundiyan pîrsî û got: Aniha hûn dizanin em dê çawa vî dermanî, bi kar binin ??

Hemiyan bi hevve gotin: Na wele em rê û rêbazên bikaranîna vî dermanî nizanin.

Mane me xwe ji bîr ve kir û me ji mêrikê dermanfiroş re ne pîrsî , ka çawa ev derman tê bikaranîn ??

Yek , dido ji gundiyan bi du dermanfiroş ketin , heta gi-hane wî û gotin :

Ka heyran te ji me re ne got , ka ev derman çawa tê bikaranîn ?

Mêrik got : Bi xwedê we ne pîrsî û min jî xwe ji bîr kir û got :

De base,piştî ku we kêça xwe girt hûnê hêdîka çavê wê vekin û tozikekê ji wî dermanî berdîn çavê wê , eger gêjnebû û ne mir , hêdîka deynin erdê û bi serê pêlava xwe , wê biperçiqîn û dev jê berdîn .


Tevan spasya wî kirin û kêfxweş û dilşad vejeriyan malên xwe .. !!!!!!!!

Gotarên ku tên weşandin, nerînen xudanên xwe ne.

Dema em behsa Zimên di-kin . tê bala me , gelo di layê şeweya zimanê devkî , yanî dema bavkên KURDAN berya (30 000) sal di KURDISTANÊ û MEZOBOTAMIYA de axivîne ? . yan mebeşt jê ew e ji dema ku şehriştanî û pêre tîp hatine afirandin bi şeweyê nivîskî 3500 sal berya zayîne ye ? .

Em ê di vî babetê zimanê KURDÎ de ,rahêjine mijara tîpên KURDÎ ,yanî mijara nivîsandinê ,ne ya axaftina bi lêvîkirinê . Dîroka zimanê kurdî ji layê afirandina tîpan ve dirêj e.Dikeve kûrahiya dema dîroka kurdên GOTÎ de .Ya dema dinivîsandin bi mixan (Bizamaran) weke ku ew beşek in ji Someriyan , mîna hemû el û gelên din ,ên di kevana zêrin a Mezobotamiyayê de .

Ew tîpên KURDÎ di destpêkê de hatin nîşankirin bi navê tîpên zindî yên tîn naskirin bi birayên me yên ÊZDÎ re , yên pê PIRTÛKA REŞ nivîsandibûn û wilo ta bawermendiya kurdan bi xudakê mitra(Roj)hat, jê re digotin zimanê mitrayî. Lê zimanê kurdî bû zimanê fermî di dewleta Mîdî de 705an B.Z, li cem Kurd û Faris û pêkhatyên din.



Tîpên ZINDÎ yên PIRTÛKA REŞ

RÊZIMAN

Di pirtûka "Somer û Ekkad" de ev evsaneya somerî hatiyê nivîsin : Rêvî ji jina xwe re got : Hîlo, ez ê bajarê "Orokê" di nav diranên xwe de, wek qivarekî bihêrim, ez ê "kulabê" weku pêlavêkê bi lingê xwe ve girêdim û wê li pey xwe bikişînim ! Dema ku nêzîkê bajêr dibin kûçik (seh) pêjna wan dikin û direyin . Rêvî radiweste û berê xwe dide jina xwe û bi tîrs dibêje : "Çimit mal, Çimit mal", hêj em li derve ne êrişî me dikin...

- Kurdî : (Biçim mal, biçim mal) Bi dîtina min, lihevhatina çend gotin û hevokan têra me nake ku em bibêjin, Somerî Kurd in, yan jî Kurd ji pašmayên Someriyan in .

Kurte Dîroka Tîpên Zimanê Kurdî

Di dema pêxember Zerdeşt (S) de zimanê kurdî xwertir û belavtir bû , dema pirtûka wî Avîsta belav bû di Rohilata navîn û Asyayê de, û wilo jê re di cihanê de digotin zimanê avîstayî û tîpên wê hatin bi navkirin bi tîpên AVISTAYÎ yên ku hijmara wan(44) tîp bûn.

Lê mixabin ew ziman êşiya li ser destê Sikenderê Mekdonî ,dema Avîsta di şewitand .


Piştî ziman û ola zerdeştî qelis bû di dema Sikenderê Meqdûnî de .Mîslmantî hate Kurdiştanê, ol û zimanê kurdan qeliştir bûn, ji ber wan ji SIKEDERÊ MEKDONÎ bihtir qirkirin bi serê wî zimanê KURDÎ de anîn.

Di dema Sasaniyên ku koka wan KURD E de, tîpên Pehlewî{Pêlewani} geş bûn di nav kurdan de.Hijmara wan 42 tîp bûn, mîna zimanên hebûn di cihanê de ,ew jî bûbû yê nivîsandin û Çandê li cem kurdan û "Ehmedê kurê WEHŞIYÊ yê NEBETÎ dibêje :Min (30) pertûk bi pehlewî dîtin li şamê .

Di pirtûka xwe de ya binavê : birîbûna bi evîn bo zanînbûna şوق المستهلكة de dibêje: Pirtûkek ji wan li ser çandina dara xurmeyê bû û ya din li ser avdaniya çandiniyê bû .Lê mixabin di dema Emewyan de li ser destê "Ebdil Melikê Mirwanî" Erebkirin bi dijwarî peya bû û yê jê dijwartir "Hecacê kurê SEQEFÎ" bû.Ku nûnerê Emewiyan bû li Iraqê.Wî hemû pirtûkên pehlewî şewitandin û ya xirabtir berpîrsiyarê dîwanê yê kurd "Za-

dan MEROX" kuşt û yekî Erebi di cihê wî de danî .

Li ser zimanê pehlewî "M. Mehemed Xînemî HILAL " zimanzanê misrî dibêje: Zimanê Pehlewî yê kurdên kevna re û wata wê gotinê yanî zimanê çekdarên mîrxasên kevna re ew romana HEZAR ŞEV Û ŞEVEK û wilo KELÎLA Û DIMNA cara yekemîn bi wî hatiye nivîsandin. (Ev di pirtûka Erebi refê yazdehan yê toreyî de di rûpelê 156 de ye).



Piştî tîpên KURDÎ bûn ên bi navê MASÎ SORATÎ .


Bi hatina misilmaniye û arîkariya a tîpên pehlewî û Masî soratî di nav zimanê Ereben NÎV GIRAVA EREBÎ de , QUR'ANA PÎROZ hate nivîsandin , û beşek ji kurdên me bi wan tîpan nivîsandin li BAŞÛR û ROJHLATÊ KURDISTANÊ bi navê tîpên SORANÎ . Lê ji ber ku beşê herî mezin ji gelê kurd di BAKURÊ KURDISTANÊ de ye û ew nêzîkî çanda latînî ye, ew bi tîpên LATÎNÎ dinivîsine , yên ku mîr CELADET BEDIRXAN bi arîkariya rohlatasê FERENSÎ ROCÊR LİSKO afirandine ji (31) tîpî û cara yekemîn 15/5/1932(z) pê kovara Hawarê hat nivîsandin . Lewra ew roj biwe CEJNA ZIMANÊ KURDÎ Koka zimanê kurdî Arî ye û ew

ji malbata Hindo-Ewropî ye, û çend devok û zaravên wî jî hene. Zaravên sereke ev in :

1- kurmanciya jorîn (weke ya me kurdên Rojava ye) 2- kurmanciya jêrîn(Soranî) 3- kurmancikî yanî Dimilkî yanî Zazakî 4- Hewramî 5- Kelhorî 6- Lorî.Hinek zimanzan dibêjin ku Goranî jî zaravêkî kurdî ye û ne devok e .

Îro bêtirî /65/melyon kesên kurd bi vî zimanî daxivin li kurdiştanê. Lê ew hijmar meştir

dibe di cihanê de. Ji sedemên nejadpereştî û stemkariyê, ew zimanê ku xwedê çekiriye û Rêxiştina navnetewî Yonisko



Tîpên PÊLEWANÎ (PEHLEWÎ)

dibêje: Zimanê kurdî yê 31an e di nav zimanê cihanê de , ew ZIMANÊ girin û xwert kete bin siha metirsiyê de , ku were



Biradost Mitani

asmilasyonkirin ,yanî helandin . Lê miletê kurd li ber xwe da û xwe û zimanê xwe paraşt. Di dawî de Zimanê me, nasnameya me ye,û dive em di ZIMANÊ xwe de bijin û wî biparêzin , ji ber ku em weke NETWA KURD pê tîn paraştin .Lewra ji me tê xwestin ku em bi erkê xwe rabin di layê axaftin û nivîsandina bi wî , di hemû deran de, bi taybet di malên xwe de .Ji ber ew dibîstana yekemîn e û wilo em guh bidin perwerda Fermî di dibîstanan de jî , ji bona ku ew hêvî û xewnên salên bûrî bicih werin û zimanê me pêş bikeve

wek xwendin û rêzmanî, mîna zimanên hemû miltan. L ewre divê em jê re xwe biweşînin bi dilsozî. Çimkî va roja azadiya gelê me hat û geya dibin kevîran de namîne .

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 9

- Li gora ku hatiye zanîn, Somerî jî Arî ne (Hindo-Îranî) ne . Vêca dibe ku ew bêje û gotinên ku di navbera zimanê Kurdî û yê Somerî de hevbeş in, ji wê koka Arî , di nav her du zimanan de mabin !

Li dûmahîya vê ronîkirinê em dikarin bibêjin, ev gotin ji kû hatibin û çawa bûbin hevbeş bila ew be, lê herî ne besî me ne ku em bibêjin, Kurd Somerî ne yan Kurd ji Someriyan in . Li vê gorê jî ne durîst e ku em bibêjin zimanê Kurdî pašmayekî zimanê Somerî ye !

Zimanê Avîstayî Bandora Avîsta û zimanê Avîstayî li gelên herêmê û zimanên wan bûye . Mes'ûd Mihemed di derbarê rola Avîsta de dibêje : " Çi tê gotin bila bê gotin, lê ya herî raşt ew e ku bandora Avîsta

ji hêla olî, rewşenbîrî û zimanî ve li gelên Arî bi giştî ron û eşkere ye . Wê bandorê heta destpêka Islamê jî berdewam kiriye "

Ew dema ku Zeradeşt tê de jidayik bûye , bi hûrbînî nehatiye nasîn . Hinek dîroknas dibêjin, Zeradeşt di sedsala heftem ya BZ de bûye, hinek jî dibêjin, Zeradeşt di sedsala nehem ya BZ de hatiye dinyê. Bi raştî, çî belge li ber destê kesî nîne ku karibe bi hûrbînî wê demê destnîşan bike . Lê tiştê ku piraniya dîroknasan tekez kiriye ew e ku Zeradeşt li herêma bakûrê rojavayê Îranê jidayik bûye . Anku, li herêma Mukriyan , başûrê Deryaceya Ormiyayê . Li gora ku dîroknas tekez dikin, Zeradeşt ji welatê bav û kalên xwe berû herêma Xurasanê ve koçber bûye û li bajarê Belxê nişteci bûye . Li wê herêmê dest



Deham Ebdulfetah

bi belavkirina peyamên doz û xwazyariyên xwe kiriye . Avîsta jî li wê herêmê pêk hatiye . Di vê pêvajoyê de mirov tûşî pîrsekê dibe : Gelo Avîsta bi zimanê Zeradeşt û bav û bapîrên wî hatiye nivîsin, yan bi zimanê welatê koçberiyê yê ku lê jiyaye ?! Bi dîtina piraniya karnasên zimanên dêrîn, Avîsta bi zimanê Zeradeşt e dayikê, zimanê welatê ku lê bûye û lê mezin bûye hatiye nivîsin .

Helbestine Bijartî ... Zerdeşt Cemal



fedî ma... Sal bihurîn Dem di gunehê xwe de cemidî...

Deriyê sînorê dilê xwe vekirin Ji

Zê, nedît ronîya rojê Xinceran rê girtin, li ber bavên bêber-awiqîn...

Dinaliyam di şevên Qanûna dirêj...

Ji hewara kezebê Ji çirokên nehewandî Ji talanên pêxwas Li ser şîya xwe weşiyam Li pahniya xwe hilkuştin Li ser Kaniya Pahn. Konê kesera dilê xwe vegirtin

Li ser tuxûbê ne ewle Kûçik dirreyan li bin şîya teşîyan Li ber tevnên nehûnandî.

Dem buhirî, ba sekinî Guran li ber hêviyên berjewendiyên xwe pal didan Li ber taldê palên pez-şevîn Li şûna mexelên Beranên Çav-reş. Xwixweş Şêrkujan şûr şikandin Di kejiyê gîzoka xwe de.

Ewr, koçber bûn bi koçrewenên bê rê Bi pilingên bê war re bûn heval Li ser rêyên bê-heval. Kaniya

Li paş deriyên nepenî Bê debar, bê-Gezik, bê Mazî Li Çiyayê Mazî Cihêrên vala hilgirtin Melodiyên Mazîçînê di dil de Bi stran axivîn...

Ji Aafara Ceh, Xela dibariya Avgermek jî bê kel dima Li ber kuçikê xuşora temirî. Çareserî Avdew dîza, bê dew Di himbêza dilê min î nesitirî'd Nesitirîn...

Di nav xeyalên xewn-zayî Min xewnek dît Jiyan diherikî di rêyên xaçîrêk Di xaçîrikên bê rê de meşiyam Li bin konê bê histûn, bûn histûn Li bin darên Mazî, holik li dar xistin Teştî ristin... Xwe sipartin bin şîya pelên daran Avzenênk mêtin, li Çiyayê bê av Roj, li siyê dihesilî, li bin darên berî.

Zerdeşt Cemal di sala 1966'an de li Dêrika Çiyayê Mazî ji dayik bû.

Di sala 1990'î jî ber rewşa awarte ya kurdistana Bakur çû Izmîrê û li wir bi cih bû.

Ji zarokatiya xwe de dest bi nivîsina helbestan kir. Di sala 2012'an de biryar da ku helbestên xwe weke pirtûk bide çap kirin.

Bermehên wî yên çapbûyî: Rîmbaûda - Bo Rîmbaûd /2012

Nihirînên Min Di Tenêtiyê de / 2016

Rêzikên Ji Misîne Birînan Nizilî ne / 2017

Helbestên Tazîbûn li Xwe Kirine / Çapa yekem û duyem: 2018

Herî dawî jî Sê Koç Rewan - Destan / 2018

SÊ KOÇ REWAN

Xeyal bîrek kûr, bê ben Bendavek bê av, tim bi kel Diherike kel, bê kel Difûrike keldûxan Diniqute xwêdan, bê deng Bê war Li ser huştuyê huştuxwaran Li ber benê bê xweda Li kevanên tarî Bê sitar mam bi carek...

Jiyan dereweke bê emir, emrekî kin Kirasekî qermîçî, weke kêlên bişkuvî Ji ber xwe dibîşkuve bi xwe-ber

Bi çavên kilkirî, bejna tenik Bi ramûsanên bê hempa Di xapan de diçilmise tim, tim.

Reşik çarika xwe girê dide Geh li Ser Xetê geh li Bin Xetê Talanî, malwêranî Li ser taca bê Welatiya min Kirin tac... Tac bû dojecha siberoja min Hişê min diniqirîne Curmê huştê min Di bin sorbelaya romiyan de Rijî hişt, dahne mîrkuatê min

Ez dinalim li ser birînen xweyî kal Ji ber horiyên bejin rihan Li ber rihanokên bînbinevş Li ser girên bê zar Ji zimanê xwe weşiyam Di xeyalên çemê Şerabê de Li bihuştê ramûsanên xweş-xeyal Ez raketim

Barê piştê min, kulên sed-salan hildigire Di Deştên rê dîr xewnên dirêj Li ser piştê dilê minî necewidî Nacebire bi xeyalên vala Bi biratiya derewîn Xeyal kulland derman nake Bi olên xapîneq...

Di bin şîya tuxûban de Mizawiran daf vegirtin Bi kemînen dil êş Êşan rû dan li rû Êş li ser rû vegezîzî... Fedî bê star, ji ber xwe bi

karwanên bê Al, ji koçberên bê Welat

Bi xwe bûn koçber, bê cî û war Xericîn di bin şîya xemê ne diyar Ref girtin Qulingên Koçrewan

Çend Şet, çi Çem derbas kirin bê bihur Rapelikîn bejna şîya şevê tarî û xewle

Ji xelean xwe berdand Rûnê Nîvişk di hîz de dihelîya Xaçîrêkan rêz girtin, bûn rê Xaçîrêk qelişîn li ber lehiyê... Di sereba dilan de hilnedihat


Şênî, di xewin xewan de weşiyam Dayikan, xof li Zarokan dilorand Dergûş, li ber navên Koçrewana radizan Tifaq kûr velidî li ber ahda sê bira Wek sê Çiyan bûn sêpek, bi hev re piştgirî Welidî jiyan seranser, li ber sozê, bi hev re piştgirî...

Gedefî, rêyek dîr, bê vege Sedema li bin şopan dişopîne Dîrok li ser şopê xwe dilûse Li ser Kaniya Nikil Li bin şîya Dara Zêl yê Ji ber şopên bi dîrok Di dojecha emrê nîvqurmiçî de.

Di ker-rika guhê min de Pêlên bê di serxweşiya perwanan de Bêndera xwe, bi pêl fire digerînin Nawelidîne carek din ji nû de Nawelidîne Mamê min.

Roj, di sereba sibê de herikî Fesadî, di legana dimsê de werimî Kun, der bû, nezan dibixudî

Li Şev-reşan Namûs xwîn digerîne Li nav Civaka Golikê mîjo Bê heştîyarî ma Netew, li Beyarê Golika Kitan û Simalan hubir, xwe neqîşand Li ser bejn û balên zirav... Şev xemiland



Misrîn micîqî Erd bêwext avis ma, tî û bê hal.

Çerm, tenêbûna xwe dibiraşt Di kûreyên vemirî Û sarınca dilê xwe de Gotin bi fikar man Deştêpêkan do didotin Do, Kar têr nedikir, Di tîrra vala Û parzûnên bê guhan Şîr, havên nedihewand

Berxên ber makê Di tariyê sawgiran de Berpezkê Şivanan, bi boçikên wan girê dida... Îro, di himbêza guheran de ker bûn Birçî, tevin tev gerandin Lal, axivîn Bi lorînan nedihewiya zikê vala Di nav qumatkên jan pêçkirî de



Şîn digeriya, Civak di kela qehwa tahl de difûriya Hêl didan wek mêran, li ser doşekên mêran Nedihatî zevtkirin bi hefsarê deh Keran Ax, di timaya xwînê de dimicîqî Sêwî, li goran dihesilî...

Sewta pêçeka min xwe girê dida Ji pêşer-rojên du-alî Ji gûmanên dostên nexalî Ji kalikê civaka sê alî... Yek bû çar, bi çar çar Çar perçe, çar nezan Bêçar difikirî yek çar...

Rûniştin li ser kulavên rîs, doşekên bi hirî Li ber bextê çar xwîndoşan raketin Di bin kumê genî de, bê guneh Li gunehên xwe hesilîn...

Şiv-xapînk dixapiyan Wek peze bê şivan Wek şivanê bê pez Bi sewta bilûra Eliko Bê kelim, sewt Li Çiyayê Mazî belav bû...

Bîranînan bîr kolan Bîr bi bîr kir Xewn û xeyalan dor tarî kir Mazî-Çinan hêl vegirtin Di hewdikan de zelq parzî-nandin Li ser hewdikê bîra Sifteke. Gurşiyên hinkase dîzerpîtin Bi hênkaya ava GolaTahtîn.

Ji Kaşê Xanka xwe berdand Li hêlîna bilbil varqilîn Ji Tirba Elikê derbas bûm Mû li canê min bû şujîn. Rêvî, li Qulrêvîkê şiv badi-da bi teresî Li dor hêlînê, tebayên nesitirî Di talda qefên huştuxwar...

Dengê Bilûra Eliko Pêlên bayê jêr, kaş dike çar bi çar Bi sewta melodiyên notajiyên bê nota Deng li Pozê Şîn diqewimî Li Lata Şekira vedida Li Kortika Curm digewimî Tahtokê, xwe diricimand Di sûretê Kevirê Nalindê

Hingama Kewê Gozel li ser Pozê Elokizîr Şujik diheland Nêçîrvan di kozikan de diqefiland Bîra Hebîskê bi comerdî Bilbilê hebîs av dida Boqa hirçê dipejirî, di xelekên Asêgê de Rapelikîm nava niv xeyalan, tev xeyalên asê Tasek av, ji Kaniya Jorîn Kulmoz derdikir, zêrr dibariya Ji kulmoza Devê Zaboqê.

Sola nigê min qîr bar dikir Ji serbilindiya Pozikê Kera Di dewlemendiya xizaniyê de... Êvar bi xew ve diçûn Ez li pê diçûm Li piyê min cihêrê binî qul, bûm Pepûk

Xwezî çandin ne bi xêr, li çolbeyaran Şîya Pozê Qirikê, xwe berda ser miskaran Evîndar, şa herikîn, nig ramedandin Li ber hênkaya cihokan.

Min paçik bi temeniyê xeyalê xwe ve Girê dida Hîz, rûnê niv-îşk dîza Ji Pozê Mêşê hinguv dirijiyaya Di sîtila gebûla Korta... Germiya fesadiya ber tenûran Li ser serê feqrê ÊrgeBaba, roj diçe ava...

Birîn, li neqebên dil vebûn Paçik, bi Zareta Tahtê Gewr ve girê dan Min qeliştokên birînen xwe Bi benîştê dara Li Bejikê Belhê derman kir Ji Pozê Holê, gav bi gav meşiyam Ber bi Pozê Tûmikê Kanî-Sork sor herikî Bû warê avdanka kewê sûsik

Silavek da KanîZeytûnê Bi helwestek dilxweş Hilkişiyam neqeba Tûrcel a xopan

Xab herikî, gul bişkivîn Delav der bûn, gelî şîn bûn Sê dil bi dil, yek gotin axivîn Zozan, bi aheng dixemilî Xof di dilan de çandin Tirsxofan bi dizî, xwe vedidizî...

Sal çilmisîn, meh derbas bûn Roj awiqî... Dem bi keser dicemidîn Bîranîn, di dil de sincirîn Stêrk rijîyan, xewn herimî Do bi cih bû, îro xemilî Çeqelî bi koxa ve kemilîn Zîndan dîr ma, roj bihirî Li şînwaran çav hesilîn Dil hulkumî Mûçîrkan dev şidandin Gulşîlav, di tenêbûna dil de qefilî...

Kultûrname

Dewlemendiya Folklorê Kurdî



Zeynulabidin Zinar

Peyvika folk wateya xwe bi kurdî ango xelk, peyvika lor jî bi wateya zanîn/zanişt e.

Peyvika folklor cara pêşî li Londrayê sal 1846, ji aliyê William Thomasî (1803-1885) ve di kovara Athenaumê de hatiye bikaranîn.

Peyvika "folklor" di nava xelkê de, ji van tiştan re tê gotin: Li welatekî, di nava gelekî/neteweyekî de, yan jî li herêmekê, ew çalakîyên taybet ên ku xasê bi xelkê ve lê ji aliyê xelkê ve bi nêvekarî tene bikaranîn, bi piranî jî di nava xelkê de ji tiştên mîna çirok, meselok, şîran, leyztik, dîroka devkî, evsane, serpehatî, deştan, henek û laqirdî, gotinên pêşiyên, tore u hwd. re tê gotin.

Lê belê peyvika "folklor" bi wî hawayê li jorê ku di nava xelkê ku tenê ji van tiştan re tê gotin, ne raşt e.

Folklorê Kurdî ew tiştên çandî ne ku tenê yê Neteweyê Kurd in, wek çirok, çîrvanok, çîrokên rawilan, şîran, meselok, pêkenok, serpehatî, heyranok û Payîzok, şîret û nesihet, Gotinên Pêşiyên, biwêj û gwd.

Folklor serwet, saman û şanaziyeke wisa pîroz û giranbiha ye ku ne jê re nixrê tê hesabkirin, ne jê re kêşan heye û ne jî pîvan çêdibe.

Ev yek eşkere ye ku hemû milletên pêşketî yê ku îro li dinyayê xwediyê dewleta xwe ya nûjen in, vê çanda xwe ya heyî li ser du bîngehan ava kirine.

Yek berhemên wan ên folklorî ne. Dido berhemên wan ên klasîk in.

Whats app'a Kurdî Êdî Li Ber Dest e

Êdî bikarhênerên sepana platforma Whats Appê dikarin bi kurdî bikar bînin.

Yek ji hezkiriyê zimanê kurdî ku li ser teknolojiyê xebatan dike Gernas Nenas WhatsApp wergerand kurdî û got êdî bikarhêner dikarin WhatsAppa Kurdî dabixînin û bikar bînin.

Di warê teknolojiyê de pêşketinek din jî li kurdî zêde dibe. Sepana peyam-şandinê û lêgerandinê ya xwedî taybetmendiyên xwe ya navbera platforman WhatsApp Messenger ya jî bo "Telefonên Jêhatî" êdî bi kurdî ye.

Nenas bi qasî mehek xwe jî çêkirina Whats app'a kurdî veqetand û bi sepana bernamaya bi navê APK eîdîtor a di Telefonê de çêkir.


bi kurdî bikar bînin dikarin peyda bikin û daxînin telefonên xwe.

Di cihanê de yek ji sepana ku herî zêde peyam pê tîn şandin WhatsApp e ku bi kurdî hat amadekirin û vê yekê kêfa bikarhênerên kurdî jî anî.

Yek ji hezkiriyê zimanê kurdî Gernas Nenas e ku di warê amûr û videoyên teknolojiyê de li ser kurdî dixebite demek dirêj bû ji bo ku WhatsAppê wergerîne kurdî dixebitî û ev xebata xwe temam kir.

Nenas behsa xebata xwe ya ku mohra serkeftina xwe lêxişt kir. Gernas Nenas diyar kir ku zimanê kurdî ne tenê zimanê axaftinê ye di heman demê de zimanê nivîsandin, xwendiyê ye û wiha got:

"Ez pir fikirîm li ser teknolojiyê. Çima em teknolojiyê bi zimanek din bikar tînin. Lewma min xwest êdî WhatsAppa kurdî jî hebe. Min çend caran bi WhatsAppê re têkilî dani lê bes bersiva erênî nedan. Xwe nêzi WhatsAppa kurdî nekirin. Min



hengek peyvên teknolojiyê nîne di warê bicihkirina peyvyan de hinek zehmetî kişandiyê û wiha dewam kir:

"Ji bilî zehmetiya peyvyan, wekî din ev xebat xweş dimeşe. Xebata kurdî ji bo min cihê kêfxweşiyê ye pê şa dibim û

tiştê wê dibe kurdî. Hemû naveroka wê bi kurdî ye. Va me çêkir, îcar dora bikarhêneran e. Ez daxwaz dikim ku tede bi tirkî nenivîsin. Em hêvî dikin ku dê hemû bikarhêner jî bo heval û dostên xwe parve bikin û wê WhatsApp jî bibîne ku va kurd xwedî li zimanê xwe derdikevin. Belkî êdî ew jî bi awayek fermî bi zimanê kurdî WhatsAppê çêbikin ku em dikarin daxînin."

Nenas destnîşan kir ku ew ê sepana WhatsAppa Kurdî li ser malpera http://teknîstan.com/dê belav bikin û got:

"Em ê ji bo daxistina WhatsAppê hemû tiştî binivîsin li ser malpera teknîstanê.

Tenê li şûna ku di Play Store de daxînin, dê li ser teknîstanê daxînin.

Her tişt eynî ye. Ne hewceye pê li tiştê teknîkî bikin. dadixînin û saz dikin."

Nenas da zanîn ku ji ber WhatsAppa kurdî jî şirketa WhatsAppê re ne fermî ye qebûl nake ku Play Store



li ser sepanê APK Eîdîtor ewil ji bo xwe ceriband. Piştî min ceriband serkeftî bû û min dît ku tê wergerandin. Pişt re ez fikirîm ku çêbikim û vê sepana kurdî belav bikim."

Nenas diyar kir ku ji ber fer-

Ji bo alikariya hemû heval û doştan jî spasdar im."

Nenas da zanîn ku ji deştê heta dawî her beşên wê bi kurdî ye û wiha got: "Heke bikarhêner rabin tede bi tirkî binivîsin ne bi kurdî ye, lê heke bi kurdî binivîsin her

Kurdî Xweş e

Table with 4 columns: Karîgirî, Dereng-mayîbûn, Qeft, Gurz, Polîn, Qapax and their corresponding Arabic terms.

Gotinên Pêşiyên

- List of Kurdish proverbs and their meanings in Arabic, such as 'Kes ji gurê xayin natirse' and 'Mezînan Got, Biçûkan Fîrto'.

Xaçpîrs

9x9 crossword puzzle grid with some cells filled with black squares.

Sitûnî

- Vertical clues for the crossword puzzle, including '1- Burxil bi Kurdî, Bila' and '2- Bi wateya Lêkolîner, tiştê Mirrov yan jî lawir hildigre'.

ASOYÎ

- Horizontal clues for the crossword puzzle, including '1- Peymana Çar-perçekirina Kurdiştanê di sala 1916'an de ji aliyê Fransiyân û Ingilîzan ve pêk hat'.

Peyva Windayî Ji bo tu peyva windayî nas bikî, peyvên li jêrê xêz bike. RÊBEND, RÊKAR, KÊMÊL, XAV, KAŞÎ, POLÎTİK, KIL, XÎZXÎZ, BERGIRÎ, BEREVAN, TEQE, PAR, XEDENG, DEWL, BEROVAJ, ÇEK

Word search grid containing letters for the words listed in the header.

Bersiva Xaçpîrsa Hejmarê Çûyî

9x9 crossword puzzle grid with some cells filled with black squares, intended for numerical answers.